Helbet ew hîn jî di Rojavayê Kurdistan de dibistanên huner û mûzîka Kurdî yê herî mezin in, xwedî şagirt û berdwam in, û hetanî vî heyamî jî ew in, xwediyê dibistana huneriyê, û hîç dibistan piştî wan çênebûne û çênabin. Nimûneyekê ji we re bêjim, niha hunermendek ku ti kesmê wî nabîne û tu dengê wî dikî, qet tu nizanî ew kî ye?! Lê Mihemed Şêxo li pişt 7 çiyayan bistre her kes nas dike ku dengê Mihemed Şêxo ye.!

– Kengî hunermend Selah Osê xwest riya xwe bibjêre. Û ji bin bandora wan hunermendan derkeve?

Belê min ev biriyar da, û min xwest ez rengekê xwe yê taybet çêbikim, nexasim piştî ku min alboma xwe ya yekem di sala 1979an de tomar kir, ez pir êşiyam jiber ku deng û şêwaza strana min nêzî ya Mihemed Şêxo bû, ew albom di nav xelkê de bû ya nemir Mihemed Şêxo, wek min gote we pir xemgîn bûm ku ew westan û keda min vale çû, lê wisa jî serbilind bûm ku xelkê rahişte wê alboma min, û jê hez kirin. Ji wir min stayîl û şêwaza xwe ya taybet çêkir.

– Gundê Til Ş'îrê "Moskoya Biçûk" wek dihat naskirin, hemû mezin û biçûkê gund mijûlî siyaset bûbûn, çima Selah Osê berê xwe da mûzîkê?

Wek ku min got, çaxa yê mamoste tembûra min a tenkeyî xiste pêşengeha dibistanê de ez hîn bûm ku mûzîk tiştekî ne biçûk e. Li gundê me siyaset di xwîn û mejiyê her gundîkî de bû, jixwe guhdan bi çand û wêjeya kurdî, gundiyan asteke mezin derbas kiribûn, hingî helbest û çîrok ezber kiribûn, nexasim jina Kurd. Jiber ku tiştek di giyanê min de bang li min dikir min berê xwe da mûzîkê. Piştî ku mezin bûm, ez hîn bûm ku huner stûna siyasetê ye.

– Astengiyên ku li pêşiya we derketin, we çawe ew derbas kirin, û gelo hin hene ku riya hunera Selah Osê şopandine?

Ji ber ku ji malbateke oldar bûm, bûm qurbaniyê ji bo şopandina hunerê di gund de, siyaset, nivîsandina helbestê ew ne qedexekirî bûn, lê tembûr ne bi dilê bavê min bû, û ez pir êşiyam, lê Çaxa ku min alboma xwe ya yekem tomar kir, bavê min lê guhdar kir, ji min re got: "Min zanîba wisa ye min rê li ber te nedigirt berdewam bike kurê min" Jixwe berî min kesî di gundê Til Şi'îrê de nerahiştiye sazê, û piştî min jî kesî ev rê nebijart, tenê keçek ji gund heye pir jêhatî ye û dengê wê jî xweş e, navê wê Xaliya ye, eger guhdan li dengê wê bibe, wê hunereke xweş pêşkêş bike.

– Em berê xwe bidin berhemên hunermend Selah Osê, çendin, û di kîjan salan de hatine tomarkirin?

Berhema min a yekem wek li jor min şîrove kir di sala 1979an de hate tomarkirin. Min yek hejmar tenê jê çap kir, hevalê min bir bajêr ji bo jixwe re hejmarekê li ber bikşîne, xwediyê tomargihê gote wî: "Ev dengê Mihemed Şêxo ye, kengî Mihemed Şêxo alboma xwe ya nû derxistiye"? Hevalê min jê re got: "Na! ev dengê hunermend Selah Osê ye" Ew î ez nas nekirim, û bidizî hejmarek jiber kişand û bi hezaran hejmar jê hatin firotin û ji xelkê re digot alboma Mihemed Şêxo ya nû ji biyaniyê derketiye. Min dengê alboma xwe li rexhin hevalan dikir min fedî dikir ez bêjim wan ev ez im, jiber ku wê ji min bawer nekirbana.! Paşê di sala 1983an de min alboma xwe ya duyem tomar kir, ew jî hat naskirin bi navê" Silavê Te Gihane Min"û hetanî niha 8 albomê min hene. Ya herî dawî di sala 2005'an de bû, lê ya sala 2002'an de nehate belavkirin, û ew ya herî ku ez pê re wistiya bûm, ew jî sedema ku kompaniya tomarkirî daxwaza gelek pereyan li min kir, û destê min jî teng bû, ew albom ma hisret û nehate belavkirin.

– Strana ku Selah Osê pê hat naskirin, strana "Silavê Te Gihane Min" em hinekî li ser wê û hîn jî zindî ye, û tê gotin û xwestin baxivin?

Bûyer û çîroka wê stranê ya min bû, ez xwediyê çîroka wê bûm, min jî wek her kesî di temenê xortaniyê de dil girtibû, mektûb ji min re şand, min jî ev gotin nivîsandin, û awaz jê re çêkirin, û bi dengê xwe min got, jiber ku ji giyanê min dihat got ewqasî bi dilê guhdaran bû. Piştî vê albomê û bi taybet ew stran ez hest bûm ku baş hatim naskirin, û min dît ku êdî barê min giran bû, û pêwîst e ez rê û şêwaza xwe biparêzim, û berhemê xweş diyarî gelê xwe bikim.

We helbest ji kê re bêtir xwendine û awaz kirine?-

Min ji kevin de û hetanî vî çaxî jî, ji Seydayê Cegerxwîn re xwendiye, helbestê wî pir bandor li min kirine, û min hejmarek baş ji wan awaz û tomar kirine jî, min gelek ji Melayê Cizîrî re jî xwendiye, û helbestek wî heye ev bû 30'î sal dixwazim bidawî bikim û hîn jî nikarim. Navê wê "Xişmê li feqîran meke, zû padîşahê min"

– We di kîjan salê de, berê xwe da lidarxistina aheng û şahiyan?

Çaxa ku min alboma xwe ya " Silavê Te Gihane Min" derxist, ez hatim naskirin, navê min dihat gotin, êdî xelk li min digeriyan ji bo ez şahiyên wan lidarxim, ez du salan bi tena xwe diçûm şahiyan, lê ez ramiyam ku pêwîst e mirov şêwaza dawet û şahiyan bughere. Yekemîn girûpa hunerî ji bo lidarxistina dawet û şahiyan min damezrand, hemû alavên mûzîkê yên nûjen û pêşketî min tevlî girûpa xwe kirin. Piştî damezrandina girûpa hunerî ez baş navdar bûm û di sala 1986an de bê sekin em diçûn dawet û şahiyan. Dixwazim vê tiştê jî ji xwendevanan re bibêjim, ku di wî heyamî de dîlana şêxanî nebû, tenê di dawîya dawetê de carnan digotin ka çend deqeyan dîlana Şêxanî lêxe! Di riya girûpa min re dîlana Şêxanî hat çesipandin di Rojihilat û Rojavayê bajarê Qamişlo de. Û ev tişt min li hemû dever û heremên Rojavayê Kurdistanê de bikar anî. bûyerekê ji we re bêjim, li bajarê Serê Kaniyê min dawet lidar xist, li wir çaxa ku bûk û zava dihatin dawet bi dawî dibû, min xwest ku ez li wir vê tiştê bugherim, min govend gerand, ji min re gotin, ev tişt şerm e, kirêt e, kesekî li vir piştî hatina bûk û zava dawet berdewam nekiriye, min ji wan re got vê şermiyên bavêjin li ser min, û ez ji ya xwe nehatim xwar, ji min re gotin 10 deqeyan dîlanê veke û hew, min se'et 5ê, 'Esrê dest bi govendê kiriye hetanî se'et 11ê şevê, ji wê dawetê û vir de hemû dawet bi vî şêwazî li Serê Kaniyê lidar diketin. Û bêtir ji 3 salan li ser hev ez mam tenê ji bo dawetên xelkê Serê Kaniyê lidar bixim..

– Gelo girûpa ta ya hunerî Cejna newrozê li gel hin komên filiklorî lidar dixist?

Belê ez li gel girûpa xwe û li gel gelek komên filiklorî di ahengên cejna Newrozê de amade dibûm, û min li Şamê komeke filiklorî damezrand navê wê "Koma Hilat" bû, hetanî niha jî ew li Şamê karê xwe berdewam dike. Ez di Koma Xanê de başxebitîm, min 3 kom di hundirê koma xanê de ava kirin."Mezin, ciwan, zarok" her wisa dibûm mihvanê koma Xelat û koma Narîn.

– Gelo ji bo lidarxistina hin şahî û ahengan hûn hatine xwestin ji bo dervî welat?

Belê ez cara yekem di sala 2000î de, ji bo cejna Newrozê hatim vexwendin ji bo welatê Siwêd, min 5 aheng lidar xistin, ew jî yên hemû partiyên siyasî bûn. Li wir ji min re gotin eger hûn bixwazin li vir bimînin hûn dikarin nîştecî bibin, min ji wan re got ez nikarim li biyaniyê bijîm, ez ahengan bidawî bikim dixwazim vegerim Qamişlo.

– Gelek hunermend niha navdar bûne, lê mixabin tenê deng xweş in!. têkiliyên wan bi alavên mûzîkê re tune ne, ew ne qlesbûneke gelo?

Ew şerm û kirêt e, hunermendê ku nizanibe li alaveke mûzîkê bixe, ew ne hunermend e, di dawetan de dikare karê xwe birêve bibe, lê di dîdarekê de, di ahengeke taybet de, eger jê hat xwestin ku hin stranan bibêje, û tembûr û biziq li wir bin û ew nizanibe bikar bîne wê çaxê wê xwe nas bike ku hunermendiya wî qelsbûn tê de heye. Jixwe vê paşiyê gelek hunermendan di dawetan de nema dengê xwe jî diwestandin, SD' ya xwe ya tomarkirî vêdixistin, û dawet lidar diket.Mixabin!!

– We çend rojan dawet lidar dixistin, dawetên me di wî heyamî de 3 roj û 7 roj bûn?

Ez bixwe giham dawetên sê roj, carekê hin hatin ji bo min bibin daweta xwe, min bazara 3 rojan bi wan re kir, bavê zava ji min re got ez feqîr im, û nikarim kiriya 3 rojan bidim te, wî heyamî jî em zehf diwastiyan 3 roj û şevan em diman û me dîlan digerand, ez ramiyam û min ji bavê zavê re got: Xalo ka we re em dawetê bikin rojek tenê, û eger tu bêjî erê ez kiriya xwe naxwazim, tenê ez dixwazim em dawetên xwe bikin rojek tenê. Bavê zava got e min, ez fedî dikim şerm e, ku ez daweta kurê xwe rojekî tenê lidar bixim, min jê re got ne şerm e, fedî neke, û bila kêmasî ji min re be. Bavê zavê biryar da û got min qebûle, û me ew dawet tenê rojekê vejand, û ji wê çaxê de dawet bûn rojek çi feqîr û çi zengîn.

– Ji bo şoreşa Sûriyê û şoreşa Rojavayê Kurdistanê we çi belav kiriye û we çi amade kiriye?

Ji bo şoreşan hunermendê şoreşger pêwist in, nimûne çaxa ku dibêjim şoreşger ez Şivan Perwer dibînim, Mihemed Şêxo bibînim, jiber ku stayîlê min strana min ya nerm û aram e, min nikarîbû ez tiştekî li gor bejna vê şoreşê û pakrewanê vê şoreşê bafrînim, huner stûna şoreşan e, lê dîsan min haziriya stranekê kiriye wê di demek nêz de bê belavkirin, ew jî li ser biyanî û koçberiyê ye, ez bi hêvî me ku cihê xwe di dilê we de bigre.

– Em berê xwe bidin pirseke din, siyaset û huner kîjan ji wan pêdiviyê hev in?

Min bi xwe siyaset kiriye, ez di partiya "Çep" de bûm, û ez gelekî ketibûm di bin bandora rehmetiyê Ismetê Seyda de, wek seyasetmedar û wek rewşenbîr û helbestvan, ez endamekî normal bûn di partiya Çepa Kurdî de, û ew serokê partiyê bû, di heftiyê de 3-4 caran dihate mala min û serdana min dikir. Jiber ku ji hunerê hez dikir. Kêm serkirdeyê me hene ku ji hunerê hez bikin.! Ji %99 siyaset bi hewceyî hunerê ye, û ew bi çavekî kêm li hunerê dinerin, ew nizanin ku huner şoreşan biser dixe, û şoreş bê huner biser nakeve. Di nav partiyên kurdan de ji bilî partiya PKK, û PYD, yek partiyê hurmet ji hunerê re negirtiye. Ew hunermendên xwe didin pêş ji wan re alboman tomar dikin, gelekî li ser hunerê jî xerc dikin.

– Hin partiyên Kurdî têkilî bi we re kirine ji bo hin karê hunerî?

Belê partiya PDK-S têkilî bi min re kirin ji bo em yekîtiyekê ji hunermendan re ava bikin, min erê kir, û min 40 hunermend ji wan re amade kirin, ji min re gotin ka nimrê wan yê telîfonê bide me, min ji wan re got va ew amade ne, we çi ji nimra wan e, gotine min divê em yeko-yeko têkiliyan bi wan re bikin, êdî min xatir ji wan xwestin, min kar berdewam nekir. Vê dawiyê PYD têkilî bi me re vekirin ji bo yekîtiya hunermendan, me gelek şert û merc danîn ber wan, qebûl kirin, û me ji xwe re tozika hundirîn jî amade kiriye û di demeke nêz de em diçin konfransê xwe.

– Em hinekî li ser karê te baxivin, ew jî karê çêkirina bizq, ûd, û tembûra ye, we çawe ev sin'et girt?

Di sala 2007an de, û jiber rewşa derverê ya abûrî min berê xwe da Şamê, li wir min hostayekî xiristiyan nas kir, ji min re got tu baş ji alavên mûzîkê fam dikî, min got na! ez tenê li bizqê dixim, ji min re got tu li gel min kar nakî, yekser min jê re got erê, ez çend mehan li gel wî mam, êdî min navendek taybet ji xwe re vekir, û min gelek afrandin di çêkirina bizq û tembûrê de kirin.

– Alava herî buha ku we firotiye?

Bizqa li ser kehrebê ya herî buha ye min berê demekî bi (500) dolarî firot, û bizqa normal bi (200) dolarî ez difroşim.

– We jikîjan hunermendê navdar re biziq yan ûd, û tembûr çêkirî ye?

Berî demekê ez ji bo "Dar Elopira" li Şamê hatim vexwendin, ewan dixwestin hin mûzîk û strana Kurdî pêşkêş bikin, li wir hunermendê navdar Se'îd Yûsif jî beşdar bûbû, min bizqa xwe ya kehrebeyî û ya normal jî bi xwe re birbû, mamoste Se'îd Yûsif bizqa min bijart ji bo pê strana xwe bêje, ew min nas dike, ji min re got tu ev bizqa xwe ji kê kiriye?, min gotiyê mamoste ev bizq ji karê desê min e, min çêkiriye. Pir kêfa wî hat ji min re got de baş e, naxwe ez ê qewîtiya du bizqan ji te bikim, û tu wan li ser kêfa xwe çê bikî. Û min du bizq ji mîrê bizqê re hunermendê navdar Se'îd Yûsif re çêkirin.

– Çima Selah Osê berê xwe neda koçberiyê?

Ez bixwe dijî koçberiyê me, nexasim koçberiya bê veger, û bi taybet hunermend. Niha di aniyên şer de pêwîst e ku hunermend moralê şervanan bilind bikin. Kesek ji nêza namire, ez çi sedeman nabînim ku hunermend ji bo wan koçber bibe. Banga min ji wan re vegerin Rojava. Hunermend Selah Osê çi şîretê li hunermendê nifşê nû dike?

Nifşê me gelek zor û zehmetî dîtin heta ku hunera xwe şopandin, em naxwazin ev nifş jî wê zor û zehmetiyê bibînê, dixwazim ji wan re bibêjim huner peyameke giring e, mirêka miletan e, huner bê xwendin qet pêş nakeve, pirinsîp û exlaq pêwîst in. huner û mûzîk amaneteke mezin e divê lê miqate bin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Sûrgûn....Evîn...Mirin

Kî Di Demboriyê De Bije Dibe Hostekarê Nalînê ...

Li ber pencereya nivîsgehê rûnîştî me, û li jiderve hesinê rojê kelkela xwe dipejiqîne. Çiya li wira ye, li hember min e, bi birîneke poşmankirî ji vî welatî. Welatê Afrodîtî(Yezdana Bedewbûnê) girava Qibirsê, a xwedî xewnên bigirî, ku di pêvajoya 42 salan de ji Tirkdagîrkirî, ne germahî, ne aramî, nedaye dilê nişteçiyên xwe. Her beyanî, hemwelatî çavên xwe ser ala Dirakola, a di ortê de nîv heyv ku stêrkek hembêz dike, çavên xwe vedikin.Tu li ku bî , li Başûr, li Bakûr, ji her qûrziyekê ve, li ser çiya ew Al diyar e. Weke ku ji hemwelatiyên vî welatî re bibêje,ez li vir im da ku hûn biteqin. Ne giring e hebûna yasayî jê re, bi dagîrkerî be, bi qirkirinê be, a giring hevoka xwe a hovan e pêşkêş bike. "Hey hovo çiqas tu bextewar î, çimkî tu hov î ".

Ev dîmen welê jî, li wan çiyayên welatê min danîne, ku hemû laşên pîroz di xwe de, bi rondikên sor hembêz kirine. Ew çiyayên ku bi sedan sal di rûpela hişê me de, nameyên yekemîn yên serhildanê û berxwedanê wergirtine. Ji vira ve! ez di wê xweliya bi xwînê avdayî de heliyame û hilim jê dikşînim. Veqtîna ji wê xweliyê, bi satoran her sibeh li serê min dixe. Li sûrgûnê, li xerîbîtiyê, tu çi navî lê dikî bike. Çiqas tu zîrek û hêja bî, wateya te nîn e, giyanê te veşartî ye, her gav bi vîna xwe li heyvê tameşe dikî. Tenha bi sîbera niştiman karî bigihêjî ronahiyê.

Nefreta herî gewr e li ba min ew e ku her sibeh ez şiyar dibim û sûrgûnê ser livînên xwe dibînim. Her roj berdaxeke mirinê, ji deryaya wê vedixum. Dibe di jiyanê de şaşîtî peyde bibin, û çareserî ji wan re hebin.

Ji bilî sûrgûn, evîn û mirinê, ku hemû mirov çi dewlemend û çi belengaz di wan de weke hevin, bê çar e ne, tu nikarî ji wan re bibêjî: min neşewtînin!. Sûrgûn birîneke, ser perava deryaya jiyana me a rojane daliqandî maye û wê dixemilîne. Ma pêdivî bi raxistina wê şewatê heye bo we hey xerîbîno!?. Bawer nakim ku pêdivî hebe, ji ber hûn jî weke min bûne zeviyê genim ê lerizî ji bêbextiya çerxê ku qerf û qirdikên xwe bi me dike. Bo xwêner ê li welat ji ciwanan re, jehrbûn û canêşiya sûrgûn ji cihêbûna niştiman ez ê bi wan re parve bikim.

cihêbûna ji welat weke bivirê ye, hemû reh pê re

Bêkes Têlo

tên qûtkirin. Bêmikûsiya sûrgûnê serberdayî ye, mirov dibe bergîlê yên dîtir an, tenê tûrê bêrîyê li stû û di hundirê te de, bi merez kevir dimîne. Her roj ew ê kurkirina giyanê te di miqilkê de bibrêje û dil dufelq bike. Heke hat û te pênasî li xerîbtî wergirt, tê avenda (leyaqa)wê li kû bicî bînî?.

Li vira..! li gel ku tu wendayî, bibirîn î, ji hebûna xwe serxweş î, lê ka ku tu karîbî destkeftiyên cîhana hundirê giyan xwe biparêzî. Li vira ne her kes hişpak, hişaza dibe û sûd ji destkeftiyên Ewropa werdigre. Ev rastiyeke,tê hîroyînkêş, keysperest, derewkar, hîz, qebe, sîxûr, hevalqelp xwedî durû, şelaf û welatperwer pêrgî bibî. Tê jiyana şênber(madî) a qûrs bibînî, loma bi kiştibana cihêbûna ji welat nelîz in. Barkirina ji welat ji rêzkariya (xita)xwe derxînin, bavêjin, pûç bikin. Yana hûnê di demboriya ji zarokitî û ciwnaiya xwe de bijîn û bibin hostekarê nalînê.

Li wira, li welat, mirov hunera sipehîbûnê û belansa jiyanê vedgerîne, awaza şînî ji tabloyên mayîn û hebûna wî hildiweşin û ji dilazarî rizgar dibe. Gelo ev ne matmayineke bê mînak e, sihirbazeke?. Ji sûrgûnê ûrê mirov lavlavê dike, ji ger, seyran û xweşiya wê ti çêj wernagire. Hergav tiştek ji te kêm e, tu şiyar, an jî raketî bî. Paş pir sal derbas dibin, tu nima zanî tu ji kû yî?.

Nefret li her tiştî dikî, çimkî tu dibî weke cûkê ku carekê xwest meşa kewê bimeşe, jiber meşa kewê nazik û pir spehî ye, lê pê re derneket, zeft nebû. Xwest vegere meşa xwe a berê, jibîr kir û pê re zeft nebû. Wisa li me hatiye, em nikarin bi civaka Ewropî hemojen bibin û êdî civaka kurdî weke heye, nima em pê razî dibin. lewra em di ortê de mane, ne li ezman in û ne jî li qadê ne, hinga weke ku tu li çolistanê bi tenê bimînî. Pêwîstî bi pirbêjî tune, cihêbûna ji welat pinderpîr e (ankebût – Spider) ku bi lîka xwe ve, xêzmal ava dike bo xwîna me bimijîne. Min vê rastiyê li hember we raxist û weke em zanin, rastî girêkeke, vekirina wê mixabin dereng dimîne.

Hevjiyana Dilsoz

Xoşnav Heso

Ta ku em têbighêjin bi suriştiya dilsoziya rasteqîne ya ku hevjiyana bilind li ser wê ava dibe, divê ku em li ser suriştiya hevjiyanê rawestin ji hêla saykolojî û em wan binyad û mercan bînin holê.

Evîna ku di hevjiyanê de nebe latek bi hêz û ku nebe kaniya berdewamiya jiyanê ew dibe wek xweku Ştinek jiyanî ji ber ku di demek kurt de ew evîn hin bi hin wê wenda bibe, û herdu hêlên hevjiyanê xwe bibînin bi hev re bêyî ku girêdanek sakolojî di navbera wan de peyda be.

Di riya dîtina beşdarê jiyanê, û anîna zarokan malbat ava dibe, yekem xal tê avakirin di tevna civakê de, bi vê derbasbûna civakî, mirov suriştiya xwe ya civakî pêk tîne, helbet bi vê gavê ew dûrî tenahiyê dibe, reng û şêwazek nû werdigre, û îdî girêdana bavîtî û dêyîtî bi cih dibe.

Rastiya hevjiyanê ne kêşeya sêks û ne jî tenê evîna pêşîn e, lêbelê wek me tekez kir, hevjiyanî daxwazek kûr e li gel mirov bo ku xwe bi beşdarê xwe re bi rengekî yekbûyî ava bikin, û kêmaniyên kesayetî bi vê girêdanê dagrin û sererast bikin.

Ji vê yekê girêdana hevjiyanî xurt dimîne, ji piştî ku hasten wan hêmen dibe, û îdî nema tenê armanc sêks û tenê evîn be, ji wê gavê ew derbasî qonaxek pîroz dibin, bi girêdanek bilind têne hûnandin û Şadbûna wan bi saya hevjiyanê dimîne ku ew herdu hêl tev de bimînin, beşdar bibin di hemû rojên tehl, beşdar bin di xweşî û nexweşiyê de.

Bi vî şêwazî, ji hevjiyana rasteqîne re dilsozî dibe binyada suriştî ji wan re, û dibe jî encamek suriştî jî, ev dilsozî dibe parêzvan ji yekbûn û xwegirtina tevna jiyanê re, parastina malbatê dike-Şana yekem- û mayina wê evîna dilsoz dibe ji erk û barê vî rengî ji dilsoziya hevjiyanî re.

Xoşnav Heso yê ku di nav Kurdên Sûrî, û rawestandina her dû kovaran: HAWAR û RONAHÎ, di wê demê de ne tenê di nav Kurdên Sûrî lê belê li tevahiya Kurdistanê, bizava toreyî lawaz bû nemaze, piştî ku Sûriyê xwe ji bin sîdariya Ferensayê rizgar kir, deriyên çapxaneyên zimanê Kurdî yên ku her dû kovarên navdar û gelek ji pirtûkên hêja çap dikirin hatin girtin û qedexekirin.

Piştî Şerê cîhanê yê didiwan li Kurdistana BaŞûr kovara GELAWÊJÊ li hemberî Şer û dijwariyên çap û belavkirinê di derketina xwe de berdewam bû, di wê demê de kovara DENGÊ GÎTÎ TAZE û rojnama JÎN a heftane jî derket.

Di 14ê Temûzê sala 1958an de li Bexdayê piştî hilweşîna sazûmana Şahanî ew dema paşverû ji nav Kurdan rabû, roja azadî û ferehiyê bi çavê serê xwe dîtin, rewşa tevgera rewşenbîriyê geş bû, nivîskar û rewşenbîrên Kurd di wê demê de 268 pirtûk dane çapkirin.

Tîrêja tevgera rewşenbîriyê ronahiya xwe da ronakbîr û nivîskarên Kurd li Sûriyê û ew perda qedexekirin û tirsê çirand.

Çend mirovên welatperwer û nivîskar gihan hev û civînek ji xwe re li mala D.Nûrî Dêrsimî li Helebê girêdan û biriyara avakirina komelekê standin dibin navê Komeleya Zanistî û Alîkariya Kurd de, ev komele ji van nivîskaran pêk dihat: D.Nûrî Dêrsimê, RewŞen Bedirxan, Hesen HiŞiyar, Osman Efendî û Heyder Heyder.

Armenca vê komelê pêŞxistina ziman, tore û dîroka miletê Kurd bû , û danasîna



Elî Çil Axa

wî bi diniyayê ve. Mixabin vê komelê temenekî dirêj nekir tenê li dora du salan temen kir 1956-1958 lê belê kar û xebatin pir bi nirx û giranbiha kirin.

Bi doza Kurd ve me 18 rûpel nivîskarek li Misrê bi destê Mihemed Hilmî Beg da kongirisa bandok dewletên nebestî ji bona ŞoreŞa –ciwanrûyên Kurdên Îranê – me protistokî bi navê Cînosayid bi zimanê Erebî – Tirkî – Ferensî – dijî Şah da belevkirin.

Bi partiya Îyoka ya Qubrisê re me hevalbendî girêda, her bûyerê wan me di rojnama xwe de didane belavkirin, jiber ku ew jî dijî dewleta Tirk û Inglîz bûn.

Çawa ku meseleyên Kurd jî li atîno serekê ola islamî Hafiz Elî ReŞîd werdigerandin zimanê Yûnanî û di rojnameyên wan de didane belavkirin. Li Beyrûtê di rojnameyên Erebî de li ser Kurd û Kurdistanê di rojnama –WICDAN û HURIYET de didan belavkirin evê komelê gelek ji pirtûkan dane çap û belavkirin ji wan pirtûkan: Elred Elekosmopolîtiya – Hisên Şiniwî, Kifah El-Ekrad– Samid El-Kurdistanî– Dêrsim Tarîhinde– Nûrî Dêrsimî.

Mixabin vê komelê di karê xwe de berdewam nekir û bi xebatek berfireh û temenekî kin rûpela jîna xwe ya dawî pêça piştî ku roleke mezin di hiŞiyariya milet de list. piştî rawestandina komelê bi çend salan ronakbîrê hêja Hesen HiŞiyar kovarek bi navê AGAHÎ bi tena xwe û veŞartî derxist, û vî nivîskarî karê kovara xwe bi xwe dikir, ji vê kovarê dora nozdeh hejmaran derketin, hejmara pêŞî di sala 1966an de ronî dît.

Kovara AGAHÎ di radeyek dijwar û zehmet de derket, bûyer û serpêhatî û nûçeyên Kurd û Kurdistanê di dane belavkirin, raman û bîr û baweriyn ku di kovarê de belav dibûn tev yên xwedî û berpirsiyarê kovarê bûn. Di kovarê de du helbest û nameyek bi tenê ne yên berpir-

Bijî Erdogan....Bimre Erdogan

Sileman Azer

Berî ku ew hewildana guhertina leŞkerî li Turkiyê zelal bibe û encama wê diyar bibe, berî ku xuya bibe ka wê ew hewildan biser bikeve an na, û ka kî li piŞt wê hewildanê ye, wek her car Kurda û bi taybetî Kurdên R,Kurdistan bilez her tiŞt bidawî kirin û kêf û Şahiya xwe bi çûna Erdogan kirin, û ta dikarim bibêjim hinan her tiŞt li Turkiyê bidawî kir û nexŞeya siyasî û civakî jî li wir çêkirin.

Jimafê her kesî ye serbest nerîn û helwesta xwe diyar bike û kêf û Şahiyê jî bike bi çûna Erdogan an xemgîn jî bibe bi Şikestina wê hewildanê û beravêtîkirina wê ji aliyê hêzên dewleta Turkiyê ve.

Lê ez dixwazim li derdora xalekê herim û werim ew xal jî di nerîna min de ya serekeye ku bandoreke wê yî mezin heye di derbirîndarkirina nerîn û helwestên mirovahî de, gelo çima ez dibime alîgirê alîyekî û li dijî aliyekî radiwestim di nerîna xweyî siyasî de.

Gelo em Kurd berjewendiyên me bi desthilatek leŞkerî re ne, an desthilatek sivil û civakî re, kî dikare min wek milet bipejirîne û ew viyan li cem hebe ku em guftûgoyan li çareserkirina pirsgirêka Kurd bikin, di baweriya min de ev xal helwest û nerîna mirov zelal dike û bandorê lê dike.

Di dîroka meyî Kurd de gelek desthilatdar di ser dagîrkirina parçeyên Kurdistanê re derbas bûn, hinin leŞkerî û hinin sivil, û di dîroka meyî nêzîk de du nimûne, desthilatdariya rêjîma Tehranê ya bi bestê Xumeynî pêk hat ne bi rengekî leŞkerî dest danîn ser dewleta îranê, lê gelo ew ji ya berî xwe baŞtir bûn ango rêjîma Riza Behlewî.nimûneyê diwemîn ew guhertina leŞkerî bû ya ku bi serkêŞiya Kenan êvrîn li Turkiyê çêbû gelo rewŞa Kurd di wê demê de li Turiyê Tehranê çawa bû, tevî wilo jî ez guhertin û bandora hêzên navdewletî jibîr nakim.

Min ev nimûne diyar kirin ji boyî tiştekî ew jî ev e ku ne her rêjîma leŞkerî an jî sivil dikare miletên dî û ta rikberên xwe jî bipejirîne, û gelek caran rêjîmên sivil kujertirin ji rêjîmên leŞkerî.

Tu tola min bi Erdogan û malbata wî re nîne wek kes, lê pirsgirêk girêdayî ye bi çareserkirina pirsgirêka Kurd re li Turkiyê ye û kiryarên wî li dijî Kurdan.Li ser vê bingehê ez dikarim wê helwestê diyar bikim.

Gelo wek ezmûnên me Kurda bi rêjîmên leŞkerî re wan dikaîbû bêtir ji Erdogan xwe nêzîkî pirsa Kurd bikin û hewil bidin vê pirsgirêkê çareser bikin, bêtir ji wî Kurda dipejirînin an na, û heger ew hewildana leŞkerî çûba serî û biser ketiba wan desthilatdaran dikarîbû ji Erdogan û partiya wî bêtir pêvajoya çareserkirina pirsgirêka Kurd berdewan bikin û vê pirsgirêkê ji kok ve çareser bikin, an wî wek Kenan êvrîn gund û bajarên Kurd biŞewitînin û koçber bikin, bi rastî her tiŞt derbarê vê yekê de tarî bû û ta niha jî diyar nebûya ka gelo ew destê veŞartî kûbûn li pey vê hewildanê, ew Golin bû wek dewleta Turk wî tawanbar dike, an aliyên nediyarin ta vê kêlîkî.

Bi rastî hîna em Kurd nikarin berjewendiyên xwe yî demkî û stratîjî ji hev derînin, ango helwest û nerînên me serpêyê ne û tu lêkolînên me yî kûr û dirêj derbarê çareserkirina pirsa Kurdî nînin, dîsa ez dikarim li wê bûyerê vegerim û bêjim gelo heger Turkiyê derbasî Şerekî navxweyî bûba û bûba dewletek ji hevketî wek Iraq û Sûriyê niha, ev yek di berjewendiya pirsgirêka Kurd bû, wê rewŞa Kurdên Bakurê Kurdistanê çawa ba, gelo wî wek ya Kurdên R, Kurdistanê ba, li gorî van bûyer û nerînan gereke helwesta Kurda zelal bibe.

Bêguman ew berjewendiyên Kurdayetî nerîn û helwesta derbarê çi bûyerê de diyar dike,lê dîsa her kes serbeste dinerîn û helwesta xwe de û pêŞeroj wê bersiva van pirsan bide.

Pênasîn Bi Kovarekê

Piştî xebata malbata Bedirxaniyan li nav Kurdên Sûrî, û rawestandina her dû kovaran: HAWAR û RONAHÎ, di wê demê de ne tenê di nav Kurdên Sûrî lê belê li tevahiya Kurdistanê, bizava toreyî lawaz bû nemaze, piştî ku Sûriyê xwe ji bin sîdariya Ferensayê rizgar kir, deriyên çapxaneyên zimanê Kurdî yên ku her dû kovarên navdar û gelek ji pirtûkên hêja çap dikirin hatin girtin û qedexekirin.

Piştî Şerê cîhanê yê didiwan li Kurdistana BaŞûr kovara GELAWÊJÊ li hemberî Şer û dijwariyên çap û belavkirinê di derketina xwe de berdewam bû, di wê demê de kovara DENGÊ GÎTÎ TAZE û rojnama JÎN a heftane jî derket.

Di 14ê Temûzê sala 1958an de li Bexdayê piştî hilweşîna sazûmana Şahanî ew dema paşverû ji nav Kurdan rabû, roja azadî û ferehiyê bi çavê serê xwe dîtin, rewşa tevgera rewşenbîriyê geş bû, nivîskar û rewşenbîrên Kurd di wê demê de 268 pirtûk dane çapkirin.

Tîrêja tevgera rewşenbîriyê ronahiya xwe da ronakbîr û nivîskarên Kurd li Sûriyê û ew perda qedexekirin û tirsê çirand.

Çend mirovên welatperwer û nivîskar gihan hev û civînek ji xwe re li mala D.Nûrî Dêrsimî li Helebê girêdan û biriyara avakirina komelekê standin dibin navê Komeleya Zanistî û Alîkariya Kurd de, ev komele ji van nivîskaran pêk dihat: D.Nûrî Dêrsimê, RewŞen Bedirxan, Hesen HiŞiyar, Osman Efendî û Heyder Heyder.

Armenca vê komelê pêŞxistina ziman, tore û dîroka miletê Kurd bû , û danasîna

Elî Çil Axa

wî bi diniyayê ve. Mixabin vê komelê temenekî dirêj nekir tenê li dora du salan temen kir 1956-1958 lê belê kar û xebatin pir bi nirx û giranbiha kirin.

Bi doza Kurd ve me 18 rûpel nivîskarek li Misrê bi destê Mihemed Hilmî Beg da kongirisa bandok dewletên nebestî ji bona ŞoreŞa –ciwanrûyên Kurdên Îranê – me protistokî bi navê Cînosayid bi zimanê Erebî – Tirkî – Ferensî – dijî Şah da belevkirin.

Bi partiya Îyoka ya Qubrisê re me hevalbendî girêda, her bûyerê wan me di rojnama xwe de didane belavkirin, jiber ku ew jî dijî dewleta Tirk û Inglîz bûn.

Çawa ku meseleyên Kurd jî li atîno serekê ola islamî Hafiz Elî ReŞîd werdigerandin zimanê Yûnanî û di rojnameyên wan de didane belavkirin. Li Beyrûtê di rojnameyên Erebî de li ser Kurd û Kurdistanê di rojnama –WICDAN û HURIYET de didan belavkirin evê komelê gelek ji pirtûkan dane çap û belavkirin ji wan pirtûkan: Elred Elekosmopolîtiya – Hisên Şiniwî, Kifah El-Ekrad– Samid El-Kurdistanî– Dêrsim Tarîhinde– Nûrî Dêrsimî.

Mixabin vê komelê di karê xwe de berdewam nekir û bi xebatek berfireh û temenekî kin rûpela jîna xwe ya dawî pêça piştî ku roleke mezin di hiŞiyariya milet de list. piştî rawestandina komelê bi çend salan ronakbîrê hêja Hesen HiŞiyar kovarek bi navê AGAHÎ bi tena xwe û veŞartî derxist, û vî nivîskarî karê kovara xwe bi xwe dikir, ji vê kovarê dora nozdeh hejmaran derketin, hejmara pêŞî di sala 1966an de ronî dît.

Kovara AGAHÎ di radeyek dijwar û zehmet de derket, bûyer û serpêhatî û nûçeyên Kurd û Kurdistanê di dane belavkirin, raman û bîr û baweriyn ku di kovarê de belav dibûn tev yên xwedî û berpirsiyarê kovarê bûn. Di kovarê de du helbest û nameyek bi tenê ne yên berpirsiyar hatine, helbestek ya peyar Ehmedê Palo ye û ya din ya peyar Hemzayê Muksî ye, name jî ya profîsor –Qenatê Kurdo ye, ku di sala 1956an de ji komelê re rêkiribû.

Xwedî û berpirsiyarê kovarê êŞ û derdê miletê xwe xweŞ naskiribû û dermanê wê nesaxiyê jî diyar kiribû bi giyanekî gewre û ramanekî bîrwer li ser giringiya yekîtiya tevgera Kurdî û miletê Kurd radiwestiya, û bi xurtî Şerê perçebûn û jihevketina tevgerê dikir, çep û rast herdu milên laŞekî, laŞ ku nebe kîjan milê çep û rast.

me bi vê danasînê rê li ber lêkolînzan û nivîskarên bi rûmet ên ku dixwazin ji miletê xwe re bixebitin û sûdekê li tore û rewŞenbîriya wî bikin vekir.

Jêder: Kovara Gelawêj û Kovara Agahî.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestin Bijartî.. Tengezarê Marînî

Bêhnok

Bila..
Zemîn di xew ve biçe!
Fîxana jana bêdeng,
şeva serxweveçûyî, himbêz dike.

Tengezarê Marînî di 04.09.1959'an de li Tirbespî, Başûrê Rojavayê Kurdistanê hate dinê. Pisporiya karmendiya mediya nû (communication, relation, presentation xwendiye.

Bila..
hêminiya elendê,
ji keziyên te çîvanokên me,
bidoşe.
Bila..
lerizandina meyê,
xunafa dengê wê biçîne.
Ez, azara we me.
Şûnwarê yariyan.
Tebûtiya pencereyên
tenêtiyê bûn,
bask ji xatirxwestinê re vekirin.

Fala qehwê,
gazindên xemleyîsiya zivistanê
bêhûde dohitin.
Îro dem rawestiya ye.
Roj sîberan jiber te vedişêre.
Ev çi dumahî ye,
bê girnijîna te, dest pêdike!?
Hêsir û bêrîkirinên te me.

Gij û tenik, tu min dibî.
Bi şevê tenêtiyê bi destê min digirt,
berbi tariyê ve,
dibûme bêje û...
Xweş e, bêliv bimînî?
Navan li pey hev rêz dikim,
ji nav tiliyan,
afirenderên xwe

Pirtûkên wî yên çapkirî: Helbest :
- Kilît 1992 weşanên kovara Zanîn
- Çirûskên xewneke bazdayî 1993 weşanên kovara ASo
- Evîna Leylan û Mijê 1998 weşanên Navenda çanda navnetewî IIK
- Şevnema şînê 2001 IIK Hannover
-Nesrîna Qedexe ji bêciriya te 2005 Weşanxana Belkî Amed
-Amed, ev qêrîna şêxê min e (Helbesta Kalo) 2008 Prîvat

bo xemleysiyê, amade dikin.
Ba

Tîrên şevê,
ez û hizrên mamoste KEVANOT,
Yên di nav
guliyên keçika koçer de mabûn, birin.
Saw, hêdî hêdî,
bê lidergehxistin,
nivişkê sewdanê min,
li ber toza xewnê lihevxist.
Tirên bû.

Şeveke weke min li xwe heyîrî bû.
Tirseke mezin bû û hingilên bêganetiyê,
xwe gihandin qûnaxa jibîrkirî.
Çi bû?
De rabe,
ta kengî,
ewê keziyên zerî û esmeran,
ji çavên te bibarin!?

Şîretek bû,
min li te kir.
Te xwe hilda û danî.
Ji sirûda xwejibîrkirinê re,
spêdeke bê dem û war
şîn hatî.
Ji qir û seqemê,
dudiliya min, serxweş nivist.

Agirê ji berfê,
sartir, bi cezme tevlî gunehê

Wergerên wî:
- Helbestên rengîn Erich Fried weşanxaneya êkîtiya nivîserên kurd Duhok 2006
- Pentelonê şeytan Îtalo Kalvîno weşanxana kovara Sivore ya zarokan
- 8 Belavok û pirtûkên li ser sîstema Tendurstiyê, li Elmaniya ji bo navenda nojdariyê ya regezan EMZ, 2010, 2011, 2012, 2014, 2015 û 2016
Rexne: Zanista Rexneyê, 2014, êkîtiya nivîserên kurd-tayê Duhok.

min bû.
Ji bêdengiyê re, bûme stûn.
Ev rewşa wê kêlîkê bû.
Bê şerim derdê xwe ji min re bibêje.
Bê tirs li min mukur were,
Tewanbaran, ez telaqreş hûnandim.
We çend caran
ji nehişyariya min,
xwe di ava ZIMZIMê de pêxistiye?!

Tirên diçe û radiweste.
Ez, ji bîrîna xwe serxweş dikevim.
Binkirasê şevê,
diterike, diderize, leriz û gilîzok tênê.
Ez û meyê,
tinaziyên xwe bihev dikin.
Ji bişirîna kîjan qeşmerî re,
binehwirênim?
Bêbextî ye rûdide.
Bêbextî ye deng dide.
Bêbextî ye reng dide.
Neşêm serpêhatiyên bajêr biparêzim.
Ji kûmirê re xwe dubare dikim.

Te li wê deverê çi dikir?
Ma te ba ji azar û nalînên min pak dikir..!?
zêrevanê bêdengiyê me.
Birûskên min,
ji xilmaşiya xwe reviyan/
belav bûn.
Şihîna koçberiyê ji asoyan buhurt.

Jibîrkirin, bi poşmaniyê,
digiha dumahiyê
Neşêm serpêhatiyên bajêr biparêzim.
Ji kûmirê re xwe dubare dikim.

Te li wê deverê çi dikir?
Ma te ba ji azar û nalînên min pak dikir..!?
zêrevanê bêdengiyê me.
Birûskên min,
ji xilmaşiya xwe reviyan/
belav bûn.
Şihîna koçberiyê ji asoyan buhurt.
Jibîrkirin, bi poşmaniyê,
digiha dumahiyê

Gera fedyok

1. Govend
Li nav sîbra te,
dizanim, kanî dipeqe;
li bêrîkirinê mukur têm.
hêrza min,
di
destên şevê de, distrînin;
berbi kaniyê ve diçim.

2. Hêlan
Westiya ye
behremendiya min,
xilamş e şev,
ji çavên te,
peyvên şermok

di matmayînê de şuştî ne.

3. Agir
Guvaştî ne,
dergehê
kolanên ewrên te
peyv li dûv peyvê
kesk
sor
sirûd
bayê hênik
payizname
oqyanos
sênca zivistanê
giryê zarokan
deng û tineyî
pirbêjî
dilbijî
kesî ez nebihîstim
bêdengî geş bû.

4. Aso
Rojeke qûngiran
Êş bêdawî ye
Mirin
Şaxên payiza rojê
Xewn û nebûna te
Rêka kadiza, spî,
hemî sûndên te.
Viyan,
di navîka rojê de xewn.
Kirîstalîzma mirinê me,
jibîrkirn
Ji kezeba deryayê,
şev û sînik
li asoyên te, pêl
dilê min,
dixure bajar, ji ewravên te.
Şeveke bêkendav mam.

Dîlberê çaxê Seher

Di dawiya şeveke xweveşartî de,
min libo libo rondik kelandin
bi sûravka jiyanê,
bîra xwe xulxuland

Li nav şeveke çavlixew de
hilma baranekê dihat
min guliyên te bi zendikên xerîbiya xwe dihûnan
û..
Di dawiya şeveke winda de

Berhemên wî bi Elmanî:
- Der Baum der Freiheit Dokumentation= dara azadiyê IIK 1998
- Funken des Nebels Helbest = çirûskên mijê IIK 2001
- Was hast du gesagt? Helbest= te çi got? privat 2012

sêva Xerîbo bi sergêjiya min re barkir
Li nav sinorên xemên min tu û tîpeke bêdeng..
li navê welatê min bêhiş ketin
Straneke şînê bû
Min û te li xwe pêça
Li ber sîvanoka demê..
Siwarê êşê lukumî
Çi dibû..?
Ji waran libo libo em difûrîn
Derdiketin, derya li me digeriya
Pêl, ji bisk û bersikên bûkên salê
Ji Zerokên ji şîr venebûyî
Kefa xwe dixemiland.
Tu û ez,
bo serketina serdestên xwe hev bêminet dikin
Erê,..
Di valahiyê de
Pirseke sêwî mam..

Şîrê Reş

Erê,..
tenê, îro tenê
weha li serê xwe siwar im
Sibe, dibe tiştek nemîne!
Tenê vê demjimêrê
dixwazim ya min bî,
êdî mirin..
Mirin bitena xwe bihêt
Ji rojeke havînî, pelek weşiya
Daristan û bilbilek
Çirokek di nav xewnên min de
Dengê nalîna bilûrê
„Hey wax li min wax
Wey lê dunyayê... „

Werçepa ji Tozê
Wisa bêdeng dihingivtî min
Giyanê te,
welatekî ji şîr û şekir,
bê derya bû,
welatekî vekirî,
di nav sinoran de raketî
nepenî payizekê azad bû
havînê
birînek herikî
li kêleka te bû
Her şev..
henaseya te,
di rûbarê hêviyan de serxweş dikim.

„Kî li wir e?“

Ew kê li min xist?
Bê bersiv mam
Wilo..!,
ez behwer im dimînî, ne wilo

ye ?
Dipirsim,
rojê bi tevayî diponijim.
Belê..? te çi got?
Ez bawer im tu yê carekê devê xwe ji hev ve bikî..
Mêze bike li wir rûdine,
dilê xwe vala dike.

Yek ji damezirênerê kovara Pirs, endamê rêdaktora kovara Stêr, û ya Pêl.
Nivîskarê goşeyên wêjeyî di rojnameyên Azadiya Welat, Evro û War.
Berhemên rexneya wêjeyî û dansîna pirtûkan, danasîna wêjeya bêgane di gelek gelek kovar, rojnameyên kurdî de hatine belavkirin.

Em bêdeng bûn.
Hindeke din jî mîna me bûn.
Û hindek bê tirs dimirin.
Ev razek e,
yariyan bike.
Bendewarê şev û rojê nemîne.
Li serê çiyê dimînî?
Nehtorê xeman î?
Dixwazî rojê bi şev bibînî..?!.
Ji Picasso min wêne wergirt,
ez birçî bûm.
Rojnameya do min xwend,
ez birçî bûm
Pirtûk min xwend,
birçî bûm.
Peyv ketin û
min taybetmendiya wê guvaşt.
Ji min re got:
–Kolanê bibire,
bi tenê here,
Ez ne melayket im,
afretek im.

Pirs û Nîv

Her ew dem bû,
çaxê pencereya wê sînga xwe ji heyvê re raxistibû.
Me mey dinoşî
Ew bendewarê xewnekê bû.
Bi tena xwe bû,
dest di ber xwe re berdan.
Te pir caran dinihêrt,
mîna rojê diçûyî.
Ev çi çêbûye îro.
Hizra te dizîvire,
Te kolan dibirîn
Modeya dahatûya nû ye.
Çi ji bilî meyê û vê mêzê dimîne?
Hevokên te dilerizin,
çi pêk nehatiye?
Vegere,
fanteziya xwe careke din vegerîne.
Bajêr berde.
Tu dara dawî yî diherifî..!
Hilmkêşana te di toza tavê de, dixeniqe.
Serok tê,
wek hercar bi tirs dipirse:
–Xewnên me li kû man?
Lê temaşe bike,
lehenga şeva me ye.
Nîvşiyar wiskî lêxe,
Sûnda bi tenê mehêle.
Ji xarekê mezintir î.
Dibêjî
Ez nikarim.
Tu rast dibêjî, baran tê.
Horas tênagihê û dipirsê:
–Helbestvano:
Tu roja xwe çawa dibihurînî.?